# Analîza zimanî

Daîreya Koçberan dê analîzê bi zimanê te bike eger te ronkirineke bawerpêkirî derbarê nasnameya xwe nedabe. Armanca analîza zimanî piştrastbûna ji wê ye ku tu ji wê derê yî ku te gotiye.

Eger biryarê bidin analîza zimanî bi te bikin, Daîreya Koçberan dê bi nivîskî gazî te bike û ev şîret dê pê re be.

Piranî caran terciman nayê gazîkirin hevdîtinê loma vê şîretê baş bixwîne.

## Analîza zimanî çawa tê kirin?

Daîreya Koçberan demekê bo te digire û te gazî hevdîtinê. Di hevdîtinê de karmendekî Daîreya Koçberan bi qasî 20 deqîqeyan axiftina te qeyd dike.

## Şîret bo analîza zimanî

- Karmendê Daîreya Koçberan dê bibêje ku kengî qeydkirin dest pê dike. Ew nikare di dema qeydkirinê de biaxive.
- Nêzîkî 20 deqîqeyan serbest biaxive. Tu dikarî bo nimûne behsa xwarinê, mijûlahiyan, hatina Fînlandayê, malê, cejnên welatê xwe, sporê û malbatê bikî.
- Ti tiştên derbarê xwe de nebêje wek navê xwe yan navên endamên malbata xwe yan sebebên xwe yên penaberiyê.
- Karmendê Daîreya Koçberan dê bibêje te gava ku qeydkirin xilas bibe.

## Piştî analîza zimanî çi dibe?

Piştî hevdîtinê Daîreya Koçberan wê qeydê dide şarezayekî bo analîzkirina axiftina te. Piştî hingê encam anku netîceyên analîza zimanî bi nivîskî digihin Daîreya Koçberan.

Eger encamên analîza zimanî li gel gotina te derbarê dera tu jê hatî li hev nekin, Daîreya Koçberan dê bi devkî yan nivîskî ji te bipirse ka çima wisa ye. Di lêpirsînê de tu dikarî sebebên wê diyar bikî.